# رۆڵی نیشانە لە ڕوونکردنەوەی واتادا

## لێکۆڵینەوەیەکی واتاسازییە

پ.ی.د.عبدالواحد مشیر محمود دزەیی
بەشی کوردی - کۆلیژی زمان/ زانکۆی سەلاحەددین/ هەولێر

**پوختە**

مرۆڤ ئابوریانە قسەدەکات ئەو زانیاریانەی کە لە ئاخاوتن وەریدەگرین زیاترە لە ڕستە و گوتن، ئەمیش لە ڕێگای نیشانەکانەوە وەریدەگرین .نیشانە (Clues) ئەنجامی کۆتایی پەیوەندی نێوان دوو ڕووداو دەردەخات، جا پەیوەندییەکە یان هۆییە یان کۆمەڵایەتییە، نیشانەکانە دەبنە سێ جۆر: (مادی، ئەقڵی، زمانی)، کە دەتوانین دابەشی بکەین بۆ (ئەقڵی و کۆمەڵایەتی) نیشانە ڕۆڵێکی بەرچاوی هەیە بۆ ڕوونکردنەوەی واتای سیمانتیکی و پراگماتیکی، بەڵام گرنگییەکی زیاتری هەیە لە ئاستی سیمانتیکدا، چونکە تەمومژی زیاتری تیا بەدیدەکرێت .

## دور القرينة فى توضيح المعنى

**الملخص**

يتناول البحث دور القرينة فى توضيح المعنى الدلالى و التداولى. للقرينة دور مهم و هى بمثابة مفتاح تستعمل لتفسير و تحليل النصوص و والمحادثات، اذن اداة لأستنباط واقعة غير ثابتة من ثبوت واقعة اخرى بسبب صلتها بها. تنقسم القرائن الى ثلاثة انواع: ( المادية،العقلية،اللغوية ) و التى يمكن تقسيمها الى قرائن عقلية وعرفية.البحث عدا المقدمة و النتائج يتكون من فصلين الاول منها يتناول المحاور التالية: القرينة،انواع القرائن،اما الثانية يتناول: القرينة و المعنى، دور القرينة فى توضيح المعنى، فى الختام تم عرض ملخص باللغتين العربية والانكليزية.

### ٠- پێشەکی:

نیشانە (Clues) بەکارهێنانێکی بڵاوی هەیە بۆ لێکدانەوە لە زمانی ڕۆژانە و بوارە جیاجیاکان وەك دەرخستنی تاوان پەروەردە و شیکردنەوە و بەدواداچوونەکانی ڕاگەیاندن ... هتد. ئەوەی تاکو ئێستا دەربارەی نیشانە باسکراوە لە زمانی کوردیدا، تەنها لە بواری ڕەوانبێژی و ڕەخنەیدا بووە لە زمانیشدا وەك : نیشانە ئامាژەییەکان Indexical Sign باسی لێوەکراوە، وەك ئەوەی دوکەڵ نیشانەی ئاگرە یان زەرد هەڵگەڕان نیشانەی نەخۆشییە....هتد .

### ٠-١- گرنگی باسەکە:

نیشانە هۆکارێکی گرنگە بۆ یەکلایکردنەوەی واتا و لادانی تەمومژ لە ڕستە و گوتندا، لە زمانی نووسین و ئاخاوتندا لێکۆڵینەوەیەکی وردی لەسەر نەکراوە و ساغ نەکراوەتەوە تا چ ڕادەیەك ڕۆڵی هەیە لە ڕوونکردنەوەی واتادا .

**٠-٢- ئامانج و سنووری باسەکە :**

ئەم لێکۆڵینەوەیە بە ئامانجی گەیشتن بە وەڵامی ئەم پرسیارانە ئەنجامدراوە کە بریتین لە :( واتای سیمانتیکی یان پراگماتیکی کامەیان زیاتر پێویستی بە نیشانەیە بۆ روونکردنەوەی واتا ؟ نیشانە سیمانتیکی و پراگماتیکییەکان چین ؟ رۆڵی نیشانە چییە لە ئابووری قسەکردن ؟ تا چ رادەیەك نیشانە رۆڵدەبینێت بۆ روونکردنەوەی واتا و لادانی لێلی ؟ ) .

**٠-٣- رێبازی باسەکە :**

ئەم لێکۆڵینەوەیە لە ژێر رۆشنایی رێبازی وەسفی ئەرکی ئەنجامدراوە، باس لە ئەرك و رۆڵی نیشانە دەکات لە روونکردنەوەی واتادا .

**٠-٤- ناوەڕۆکی باسەکە :**

لێکۆڵینەوەکە، جگە لە پێشەکی و ئەنجام لە دووبەش پێکهاتووە، بەشی یەکەم ئەم سەر دێرانە دەگرێتەخۆ : ( پێناسەی نیشانە، جۆرەکانی نیشانە، بەشی دووەمیش باس لەم سەردێرانە دەکات : نیشانە و واتا، رۆڵی نیشانە لە روونکردنەوەی واتادا ) .

**بەشی یەکەم : نیشانە و جۆرەکانی :**

نیشانە مێژوویەکی کۆنی هەیە هەروەك چیرۆکی یوسف پێغەمبەر، کە لە قورئانی پیرۆزدا باسکراوە : "واستبقا الباب وقدت قميصه من دبرٍ وألفيا سيدها لدى الباب قالت : ما جزاء من أراد بأهلك سوءاً إلا أن يسجن أو عذاب أليم. قال: هي راودتني عن نفسي و شهد شاهد من أهلها إن كان قميصه قد من قبل فصدقت وهو من الكاذبين وإن كان قميصه قد من دبر فكذبت و هو من الصادقين . فلما رأى قميصه قد من دبر قال: إنه من كيدكن إن كيدكن عظيم"(١) ، دڕانی کراسەکەی حەزرەتی یوسف لە دواوە، بووە نیشانەی بێتاوانی، لەم رۆژگارەی ئێستاشماندا سەرەڕای ئەوەی کە زانست و تەکنەلۆجیا پێشکەوتنێکی زۆری بەخۆیەوە بینیوە وەك دەرکەوتنی پشکنینی (D.NA) و مۆری پەنجە ....هتد، بەڵام نیشانە زمانییەکان و لۆجیکییەکان. تاکو ئێستاش جێگای بایەخن لە زۆر بواردا.

**١-١- پێناسەی نیشانە :**

نیشانە (Clues) بنەمایەکی گرنگە بۆ تێگەیشتن و لێکدانەوە و جیاکردنەوەی دەربڕینی دورست و خوازە و روونکردنەوەی دەربڕینە شاراوەکان، نیشانە کلیلی نەهێشتنی لێلی دەگەیەنێت، [نیشانە چ لە ناو رستە و گوتن بێت یان دەوروبەر، چەمکێکی شوێن کەوتووی وشەیە و بۆ گەیشتن بە واتای مەبەست] (٢). وشەکان لەکاتی بەیەکەوەهاتن لە سنووری جووتە وشە و گرێ و رستە و گوتن یان ئاخاوتن کاریگەری دەکەنە سەر یەکتر و یەکیان ئەویتر روون دەکاتەوە واتای وشەکە جگە لەواتا فەرهەنگییەکەی واتایەکی تر وەردەگرێت ئەم واتایە دەبێتە نیشانە بۆ روونکردنەوە.

نیشانە ئەو ئاماژانەیە لە بارێکی نادیارەوە بۆ بارێکی دیارمان دەبات و واتامان بۆ روونەدەکاتەوە، بۆ نموونە جێگای خشانێکی درێژی بێ مەبەستی پێچکەی ئۆتۆمبێل، کە رووداوێکی ئەنجامدابێت دەمانگەیەنێتە ئەوەی، کە ئۆتۆمۆبیلەکە خێراکەی زیاد لە پێویستبووە. یان رستەیەکی وەك :

- شێروان هات ئینجا شێرزاد .

لێرەدا قسەکەر دەیەوێت پێمان بڵێت، سەرەتا (شێروان) هاتووە و دواتر (شێرزاد) ئەو نیشانەیەی کە ئەم راستییەی خستەروو (ئینجا) یە. کە لە رستەدا وەك ئامرازی لێکدەر خۆی دەرخستووە.

**١-٢- جۆرەکانی نیشانە:**

نیشانەکان زۆر جۆرن و دەتوانین لەسەر زۆر بنەما پۆلینیان بکەین، وەك بەهێزی و بێهێزی، سەربەخۆ و لکاوی، ئاشکراو شاراوە، هۆشەکی و کۆمەڵایەتی....هتد. سەرەڕای ئەمانەش تێکچڕژان و چوونە ناویەکی پێوە دیارە، ئێمەش تەنها بەمەبەستی لێکۆڵینەوە دابەشمان کردووە بۆ ( مادی و ئەقڵی و زمانی) :

**١-٢-١- نیشانە مادییەکان** Indexical Sign :

ئەم نیشانانە دەگرێتەوە کە[پەیوەندییەکی هۆیی لە نێوان فۆرم و واتاکەیاندا هەیە] (٣) وەك : دوکەڵ نیشانەی بوونی ئاگرە و جێ پێی کەروێشك ئاماژەییە بۆ رۆیشتنی کەروێشك لەم شوێنە و مۆری پەنجە و کەلەپەل و پاشماوەی تاوان ئاماژەیە بۆ تێوەگلانی لە تاوان و دەرکەوتنی نیشانەکانی نەخۆشی....هتد، کە بوونێکی مادییان هەیە.

**١-٢-٢- نیشانە ئەقڵییەکان:**

ئەو نیشانانە دەگرێتەوە کە پەیوەندی بە ئەقڵ و هۆش و لۆجیکەوە هەیە و دوای بیرکردنەوە دەخرێتەروو و دەبێتە دوو جۆر :

**١-٢-٢-١- نیشانە هۆشەکییەکان:**

ئەو نیشانانە دەگرێتەوە کە رێکەوتنێکی گشتی لەسەرە و پێویست بە گوتن ناکات، بۆ نموونە کاتێك کە دەگوترێت : - دەستەخوشکەکانت ئەو رۆژە کارتیان وەرگرتەوە ناجح نەبوون.

لێرەدا ئێمە دەزانین، کە ئەوەی قسەی لەگەڵ کراوە کچە، دواتریش قوتابییە و دواتریش دەستەخوشکەکانی تەمبەڵن. بە نیشانەی (دەستە خوشك) روونەبێتەوە کچە و بە نیشانەی ( کارت وەرگرتنەوە ) دەزانین قوتابییە و خوێندکارە و بە نیشانەی ( ناجیح نەبوون ) دەزانین کە تەمبەڵن یان نەیان خوێندووە .

**١-٢-٢-٢- نیشانە لۆجیکییەکان :**

هەر لێکۆڵینەوەك لە نیشانەکان بکرێت ئەوا دەبێت لە چوارچێوەی لۆجیکەوە بێت، چونکە پەیوەندی بە لۆجیکەوە هەیە لە دوو رووەوە :

أ- راستەخۆ : زۆرجار واتاکان لە رێگای لۆجیکەوە وەردەگرین تاکە بڕیاری راستی و ناراستی یا گونجاوی نەگونجاوی لۆجیکە .

ب- ناراستەخۆ: لە رێگای لێکدانەوەی واتا رێزمانییەکانی نێو دەربڕینە زمانیەکان، ئەویش لە رێگای پەیوەندی نێوان واتای رێزمانی و واتای لۆجیکی.[پێوانەی لۆجیکی بریتیە لە پراکتیزەکردنی دەستووری گشتی لەسەر بەش بۆ نموونە :

- هەموو ئەوانەی بە گەرمایی دەکشێن کانزان . ئاسن بە گەرما دەکشێت. <<< ئاسن کانزایە.

لێرەدا یاسا گشتیەکە بریتییە لە : هەموو ( ئەوانەی بە گەرما دەکشێن کانزان )، بەشەکەش بریتییە لە (ئاسن)، جا ئەو بریارەی کە داومانە بریتییە لە :( کانزایی ئاسن )] (٤) بە پێوانەی ئەوەی، چونکە بە گەرمایی دەکشێت. پێوانەی لۆجیکی لەسەر چەند بنەمایەك کاردەکات (٥) :

١- بابەتی پێوانە :پێوانەی لۆجیکی لە دوو پێشەکی پێکدێت :

أ- پێشەکی گەورە : بریتییە لەو پێشەکییەی، کە یاسا گشتییەکەی دەوەستێتە سەر و دەمانەوێت پراکتیزەی بکەین لەسەر بەش، لە ڕێگای دەرکەوتە و پێوانە وەك : هەموو کانزایەك بە گەرمایی دەکشێت.

ب- پێشەکی بچووك : ئەو پێشەکییەیە کە بەشەکان دەگرێتەوە و دەمانەوێت بە پێوانە بیسەلمێنین وەك : ئایا ئاسن بە گەرمایی دەکشێت ؟

٢- سنوور : بریتیە لە وشەکانی هەردوو پێشەکییەکە وەك: هەموو، ئاسن، کانزا، بەگەرمایی کشان،....هتد .

٣- داواکراو: بریتیە لە سەلماندنی سەپاندنی گشت لەسەر بەش. واتە: ئاسن بەشێکە لە کانزا .

٤- ئەنجام : بریتیە لەم ئەنجامەی کە دەست دەکەوێت لە سەپاندنی یاساکە (٦) وەك : ئاسن کانزایە

.پێوانەی لۆجیکی دوو جۆرە :

أ- هەڵاوێرکردن: پێوانەی مەرجی دەگرێتەوە، کە لە پێشەکییەکەیەوە دیارە وەك :

- ئەگەر شێرزاد مەلا بێت ← ڕێزی بگیرێت. شێرزاد مەلایە.<<< دەبێت ڕێزی لێبگیرێت.

ب- بەیەکەوە هاتن: لە پێشەکییەکە دا ئەنجام و دژەکەی ڕانەگەینراوە وەك :

- جیهان لە گۆڕاندایە . هەموو گۆرانێك ڕووداوە. <<< جیهان ڕووداوە.

پێوانەی بەیەکەوە هاتن دوو جۆرە (٧) :

١- بەیەکەوە هاتنی بارکراو: تەنها لە باسە هەڵگیراوە بارکراوەکان پێکهاتووە وەك :

- کۆتر باڵندەیە .هەموو باڵندەیەکیش ئاژەڵە. <<< کۆتر ئاژەڵە.

٢- بەیەکەوە هاتنی مەرجی : پێکهاتووە لە باسە مەرجییەکان وەك :

- ئازاد ئەگەر نمرەی کۆلیژ دەرکات ← باوکی ئۆتۆمۆبیلی بۆ دەکرێت .

- ئازاد نمرەی کۆلیژی دەرنەکرد < << باوکی ئۆتۆمۆبیلی بۆ ناکرێت.

**١-٢-٣- نیشانە زمانییەکان :**

نیشانە زمانییەکان پەیوەندی بە رستە و گوتنەکانی پێشتر و دواترەوە هەیە و لە پاڵ وشە و رستە و لارستە و گوتنەکان دێت و واتامان لە دەوروبەر بۆ ڕووندەکەنەوە جا چ دەوروبەری تێکستی زمانی بێت یان دەوروبەری ئاخاوتن بێت، نیشانەکان لە رووی جۆرەکانیەوە تێکچڕژانێکی تێیدایە و هەندێ نیشانە دەبنە هاوبەش لە نێوان نیشانە واتایی و ڕێزمانییەکان، وەك : نیشانەکانی ڕێکخستن و کات و شوێن و ....هتد، نیشانە زمانییەکان دەبێتە دوو جۆر :

**١-٢-٣-١- نیشانە ڕێزمانییەکان :**

ئـەم جـۆرە نیشـانەیە واتـای ڕێزمـانی دیاریدەکـەن کـە ئـەرکی گونجـان دەبیـنن (Coherence) (٨) و پەیوەستە بە زانیاری ڕێزمانی و دەبنە چەند جۆرێك :

**١-٢-٣-١- ١- نیشانەکانی دانە پاڵ :**

بریتیـە لـە پەیوەنـدی کەرەسـەکانی نـاو ڕسـتە لەگـەڵ یـەك، وەك [پەیوەنـدی کـار بـە بکـەر و بـەرکار ......هتد] (٩) . بۆ نموونە : ڕستەیەکی وەك :– دارەکە گەڵای وەری .

لێرەدا هەرچەندە (دار) لە شوێنی بکەرە، بەڵام هەست بەوەدەکەین، کە کاری وەرین دەدرێتە پاڵ (گەڵا) نەك (دار) بۆیەش (گەڵا) بکەرە. لە هەمان کاتیشدا درك بەوەدەکەین، کە کاری (وەری) تێنەپەڕە و پێویستی بە یەك کەرستە هەیە ئەویش (بکەر) .

**١-٢-٣-١- ٢- نیشانەکانی تایبەتبوون :**

ئەم جۆرە نیشانەیە گوزارشت لە واتایەکی تایبەتی دەکات بۆ تێگەیشتن لە [ڕێگای ئەو ئاماژانەی کە کارەکە یان ئاوەڵناوەکە دەیکات] (١٠) ئەمەش بەستانەوە و کۆتێکە بۆ پەیوەندی نیشانەی دانەپاڵ، کە دەبێتە چەند جۆرێك :

**١-٢-٣-١- ٢-١- تێپەڕاندن :**

مەبەست ئەوەیە[هەرکاتێ بەرکار لە ڕستەدا هەبوو،ئەوا نیشانەیە بۆ بوونی کاری تێپەڕ] (١١) وەك :

– ئازاد لە ڕزگاری دا . دەبینین لێدانەکە لەسەر (ڕزگار) بووە، واتە (بەرکارە) بۆیە دەبێتە نیشانە کە کاری (لێدان) تێپەڕە .

**١-٢-٣-١- ٢-٢- ئاوەڵکاری :**

ئاوەڵکار بەشێکە لە بەشەکانی ئاخاوتن، کە کات و شوێن و چۆنییەتی ڕوودان دەردەخات کە بریتین لە :

أ– ئاوەڵکاری هۆ و مەبەست (Intension) : ئەم جۆرە نیشانەیە بۆ دەرخستنی مەبەست و دیارکردنی هۆیە وەك : – بـۆ دیـدەنی تـۆ هـاتووم . کـاری هـاتن لـەم ڕسـتەی سـەرەوەدا دراوەتـە پـاڵ مـن و [بەستراوەتەوە بە هۆیەکی تایبەت، کە دەرخستنی مەبەستە لەم هاتنە](١٢). لە ڕێگای دەستەواژەی (بۆ دیدەنی تۆ) واتە سەردانەکەم بۆ ئەم مەبەستە بووە، لە هەمان کاتیشدا ئەو تەمومژیە دەرەوێنێتەوە، کە لەلای گوێگر دروست دەبێت کاتێ واتێبگات بۆ مەبەستێکی تر هاتبێت .

ب– ئاوەڵکاری کات : لێرەدا مەبەستمان ئەو ئامرازانەیە، کە وەك ئاوەڵکاری کات کاردەکەن نەك ئامراز وەك :– کەی ڕۆژ ئاوابوو دێمەوە . لێرەدا (کەی) چەمکی ئاوەڵکاری تیایە .

نیشانەکان کاردەکەن بۆ دیاریکردنی کات، کە [ئەم کارە ڕانەبردووانە دەگرێتەوە، کە دوای ئامرازەکانی (کەواتە،هەتا،هەرگیز....هتد)] (١٣) بۆ نموونە :– هەرگیز نایێم. (هەرگیز) لەم ڕستەیە بۆ دەرخستنی کاتەکەیە کە ڕوونادات .

ج– ئاوەڵکاری شوێن : نیشانەکان بۆ دیاریکردنی شوێن کاردەکەن وەك :– بڕۆ تا دەگەیتە بازار.

(تا) لەم ڕستەیەی سەرەوە (تا) بۆ دەرخستنی شوێنە بەمەش ناوەڕاست یان تا کۆتایی بازار دەگرێتەوە .

ج- ئاوەڵکاری چۆنییەتی : چۆنیەتی روودانی کارەکە دەستنیشان دەکاتەوە (١٤) لە هەمان کاتیشدا جەختکردن و دیاریکردنە بۆ نموونە کە دەڵێین :- نەرم نەرم دەڕوات . (جەخت لەسەر چۆنییەتی دەکات).

ئامرازەکانی لێکچواندن کە بریتین لە (وەك،عەینەن، ئەڵێی، ...هتد) دەتوانن رۆڵی ئاوەڵکاری چۆنییەتی ببین و ببنە نیشانە وەك :- شارەکە وەك بووك رازابووەوە. لەم رستەیەدا (وەك) بۆتە نیشانە بۆ رادە و چۆنییەتی رازاندنەوەکە .

**١-٢-٣-١- ٢-٣- سنووردارکردن و جەختکردن :**

واتای روودان لە کار دەگرێتەوە (١٥)، کە جەخت لەسەر روودان و سنووردارکردن دەکاتەوە، کە هەندێ جار بە بەکارهێنانی راناودەبێت یان کاتی رابردوو دەبێت وەیا بە هێز Stress خستنەسەر وشەی مەبەست یان دووبارەبوونەوە. وەك :- من چووم . لێرەدا (من) رۆڵی جەختکردنەوە دەبینێت .

**١-٢-٣-١- ٣- نیشانە ئامرازییەکان** (١٦):

بەکارهێنانی ئامراز نیشانەیەکە بۆ دۆزینەوە و روونکردنەوەی واتا، ئامراز بۆ مەبەستی جیاجیا بەکاردەهێندرێن، جا ئەگەر ئامرازەکان بناسرێن دەتواندرێت مەبەستەکانیش بزاندرێت وەك :

أ- ئامرازەکانی بەستنەوە : ئامرازەکانی بەستنەوە لە زمانی کوردیدا بریتین لە (لە،بە،بۆ،تا،و،بەلام، یا....هتد) کە ئەرکی بەستنەوە دەبینن و دەبنە نیشانەش بۆ مەبەستی تر وەك :

- ئازاد و نەوزاد هاتن. ئەم (و) ە نیشانەیە کە هەردووکیان هاتوون، چونکە (و) ئامرازێکە و نیشانەیە بۆ پەیوەستی رستەی یەکەم بە رستەی دووەم، بەلام کاتێك دەڵێین:

- ئازاد هات، بەلام نەوزاد نەهات . سەرەڕای ئەوەی (بەلام) ئەرکی لێکدانی ئەم دوو ڕستەیەی بینیوە و بۆتە نیشانەش، کە ڕستەی دووەم پێچەوانەی رستەی یەکەمە .

ب- ئامرازەکانی پرس : ئامرازەکانی پرس زۆرن وەك ( کێ،چەند،بۆ،چ،ئایا...هتد) بۆ پرسیارکردن بەکاردێت وەك :- ئەم کتێبەت بەچەند کڕی ؟ (بەچەند) نیشانەیە بۆ پرس .

ج- ئامرازەکانی سەرسوڕمان : ئامرازەکانی سەرسورمان لە زمانی کوردیدا بریتین لە :(ئاخ، ئای، ئۆخەی، ئەها....هتد) کە دەبنە نیشانە بۆ سەرسامی بوون بە خۆشی و ناخۆشی وەك :

- ئای ئەمە خەریکی چی؟! ئامرازی (ئای) نیشانەیە بۆ سەرسورمانی .

د- ئامرازی هەڵاوێرکردن : (تەنها) بۆ جیاکردنەوە و هەڵاوێرکردن بەکاردێت وەك :

- هەموو هاتبوون تەنها دڵشاد نەبێت. لەم رستەیەی سەرەوەدا [هاتنمان داوەتە پاڵ (هەموو) و نەهاتنمان داوتە پاڵ (دڵشاد) بە ئامرازی (تەنها) هەڵاوێرمانکردووە و لە هەموو دەرمانکردووە] (١٧)، کەواتە ئەوەی دوای ( تەنها) دێت، نیشانەیە بۆ هەڵاوێرکردن .

هـ- ئامرازی مەرج : ئامرازەکانی مەرج لە زمانی کوردیدا ئەمانەن ( ئەگەر،کە، تا، ئەگینا...هتد) کە لە رستەی مەرجدا بەشداری دەکەن وەك :- ئەگەر براکەت پارەکەی نەهێنا،من خۆم پێت دەدەم .

لەم رستەیەدا (ئەگەر) بۆ نیشانە کە پارەپێدانەکە مەرج دارە بە نەهێنانی پارەکە لە لایەن براکەیەوە .

و- ئامرازەکانی گومان : ئامرازەکانی (بەڵکو،لەوانەیە،رەنگە،گەر،....هتد) بۆ گومان بەکار دەهێنرێت وەك :- لەوانەیە نەخۆشەکە چاکبێتەوە . لەم رستەیەی سەرەوەدا ئامرازی ( لەوانەیە) نیشانەیە بۆ گومان دەربڕین لە چاکبوونەوەی نەخۆشەکە .

ز- ئامرازەکانی ئاوات خواستن و پەشیمانبوونەوە : ئامرازەکانی وەك (خۆزگە، بریا، کاشکی،.. هتد) بۆ خۆزگە و ئاوات خواستن یان پەشیمانبوونەوە بەکاردەهێنرێت وەك :

- خۆزگە کاتی خۆی دەمخوێند. لەم رستەیەی سەرەوەدا (خۆزگە) نیشانەیە بۆ پەشیمانبوونەوە و ئاوات خواستن بۆ کارێك کە (خوێندن) ە و پێشتر ئەنجامی نەداوە .

**١-٢-٣-١- ٤- نیشانە مۆرفیمییە بەندەکان :**

مەبەستمان ئەو مۆرفیمە بەندانەیە کە [واتای فەرهەنگیان نیە،بەڵکو واتایەکی رێزمانیان هەیە] (١٨) وەك :(ت،د،ا،ی،و) مۆرفیمەکانی کاتی رابردوو و (ە) ی ئێستا و (ێ) داهاتوو و( اند) تێپەڕاند و (ەوە) دووبارەبوونەوە (ر) بکەر نادیار و [(ب) ی ئارایی و (ن،م) نەرێکردن....هتد] (١٩)، هەروەها مۆرفیمە بەندەکانی(ان) کۆ،(ەکە)ی ناسیاوە،(ێك) نەناسیاوی،...هتد. هاتنی هەریەك لەم مۆرفیمانە دەبێتە بەڵگە، بۆ نموونە بوونی مۆرفیمی (ێ) لە وشەی دەچێ نیشانەیە کە کارەکە (رانەبردووە). هەروەها هەندێ مۆرفیمیش نیشانەن بۆ رەگەز، [(ە) بۆ نێر وەك: کوڕە، مامە،...هتد و (ێ) بۆ مێ وەك : کچێ، پورێ...هتد] (٢٠) .

**١-٢-٣-١- ٥- پەیوەندییە رێزمانییەکان :**

نیشانەیەکی دەربڕینە کە [پەیوەندی وشە پەیوەستدارەکان بەیەکەوە دەردەخات، کە لە رێگای جێناو یان ئامرازی پەیوەندی یان ئامرازی نیشانە یان دووبارە بوونەوەی وشە Recurrence](٢١) وەك پەیوەستی گرێی ناوی و ئاوەڵناوی و پەیوەندی نێوان ناو و ئاوەڵناو....هتد.وەك : کچ ی جوان هات .

**١-٢-٣-١- ٦- نیشانە رێککەوتنییەکان :**

رێکەوتن Agreement لە کەس person و ژمارە Number و رەگەز Gender و دۆخ Case و دیاریکردن Deixis چەند نیشانەیەکن بۆ دەستنیشانکردنی واتا، بۆ نموونە لە [رێکەوتنی کەسدا ئەگەر بکەر تاکبێت دەبێت کارەکەش تاك بێت، ئەگەر بکەر کۆ بێت دەبێت کارەکەش کۆ بێت] (٢٢).وەك :

(٢٥)- قەلەکە فڕی؟ قەل ناوە تاکە، فڕی کارە تاکە. لە زمانی کوردیدا جیاوازییەك بەدی دەکرێت لە رێکەوتن بۆ نموونە لە کرمانجی ناوەراست رێکەوتنی بکەر لەگەڵ بەرکارە (٢٣) وەك :

- ئێمە نانمان خوارد.

لە سنووری رستەدا چەندین رێکەوتنی تر بەدی دەکرێت، بۆ نموونە هاتنی (ەکە) ناسیاوی لەگەڵ (ان) کۆ و نەهاتنی (ێك) ی نەناسیاوی لەگەڵ (ان) و (ئەم....ە ، ئەو.....ە )ی نیشانە و [دەرکەوتنی رادە لەگەڵ ئاوەڵناو و ئاوەڵکار و نەهاتنی لەگەڵ ناو کار. هەروەها نەهاتنی ژمارە لەگەڵ ئامرازی کۆ] (٢٤) دروستی رێزمانی و واتایی مەرجن بۆ ئاسایی رستە،[دروستی رێزمانی بریتیە لەو یاسایانەی کە چۆنییەتی پەیوەندی کەرەسەکانی رستە دەستنیشان دەکەن لەگەڵ یاساکانی چۆنییەتی رێزبوونی

کەرەستەکان لە رستەدا، دروستی واتایش بریتییە لەو کۆتە واتایانەی کە کەرەستەیکی رستە بەسەر ئەوانی تردا دەیسەپێنێت، کە بریتییە لە کۆتی هەڵبژاردن و بەیەکەوەهاتن] (٢٥).

**١-٢-٣-١- ٧- نیشانە شوێنییەکان :**

دارشتنی هەر وشەیك جیایە لە وشەیەکی تر بۆ نموونە ناو جیایە لەگەڵ ئاوەڵناو و ئاوەڵکار....هتد (٢٦). بەشەکانی ئاخاوتن بریتین: لە ناو و کار و ئامراز و ئاوەڵناو و ئاوەڵکار و...هتد. ئاشکرایە لەزمانی کوریدا شوێنی هەریەك لەم وشانە دیارە بۆ نموونە، ناو دەکەوێتە سەرەتا و کار دەکەوێتە کۆتایی و.....هتد. ئەمەش بۆ خۆی دەبێتە نیشانە و بەڵگەیەك بۆ ئەوەی هەر کەرەستەیەك لەم شوێنانەدا بێت ئەوا لەو بەشە ئاخاوتنە پۆلین دەکرێت کە تیایەتی بۆ نموونە :

– زدلان رانلا ی سامراند.

ئەم رستەیە ئەگەر چی واتای وشەکان نازانین هیچیشی لیٚ تێناگەین، بەڵام دەزانین رستەیە (٢٧) و تارادەیەك کوردیە، کە بە دوو نیشانە دەناسینەوە کە (ی) راناوی لکاوە و (اند) تێپەراندنە، هەروەها ئەوەش جیادەکەینەوە کە (زدلان) ناوە بکەرە (رانلا) ناوە و بەرکارە و (سامراند) کارە، ئەم واتایەش لە ئەنجامی ئەوەدا هاتووە. ئەگەر وشە لە شوێنی جیاجیا بەکاربێنیت ئەوا بەشە ئاخاوتنەکەی دەگۆڕێت، بۆ نموونە وشەیەکی وەك (جوان) لە بنەرەتدا (ئاوەڵناوە)، بەڵام مەرجیش نییە، چونکە زۆرجار بەپێی شوێنەکەی پۆلەکەی خۆی دەگۆڕێت و دەبێتە ئاوەڵناو و ئاوەڵکار وەك :

– جوان قوتابیەکی زیرەکی پۆلەکەیەتی. (ناو)

– مناڵەکە جوان دەڕوات . (ئاوەڵکار)

**١-٢-٣-١- ٨- نیشانە ڕیکخستنییەکان :**

پاش و پێشکردنی وشەکان لە سنووری رستە (٢٨) لە زۆر باردا دەبنە نیشانە بۆ روونکردنەوەی واتا لە رستەدا، بۆ نموونە ئەگەر بەراوردێکی ئەم دوو رستەیە بکەین :

أ– رزگار لە ئازادی دا.

ب– ئازاد لە رزگاری دا.

دەبینین بکەری رستەی (أ) جیاوازە لە بکەری رستەی (ب) [ئەوەی بۆمان روندەکاتەوە و پێمان دەڵێت ئەوا ڕێزکردنەکەیە بۆتە نیشانە] (٢٩)، چونکە شوێنی کەرەستەکان گۆڕاوە و بەمەش ئەرکیان دەگۆڕێت .دیسان رستەیەکی وەك :

(أ)– ڕێزان هات .

(ب)– هات ڕێزان .

ئەم دوورستەیە لە واتادا جیان بە نیشانەی پاش و پێشکردنی بکەر و کار (٣٠)، هەندێك جاریش بەدوای یەکداهاتن و نەهاتنی دانە زمانییەکان دەگەیەنێن (٣١)، بۆ نموونە بەیەکەوە هاتنی ماسی و ئاو و نەهەنگ و بووکی دەریا و قرش و شەپۆلی دەریا.....هتد. ئەمانە ئاساییە لەگەڵ یەك بێن، هەر کاتێك ئەم بەیەکەوە هاتنە رەچاو نەکرا دەبێتە نیشانە وەك :– سەگ و نەهەنگ م بینی .

پچڕانی ئەم پەیوەندیە بۆتە نیشانە، کە گومان لە راستی دەربڕینەکە بکرێت. بە پێچەوانەشەوە رەچاوکردنی دەبێتە نیشانە بۆ تەواوی دەربڕینەکە.

**١-٢-٣-٢- نیشانە دەوروبەرییەکان :**

ئەم جۆرە نیشانانە هەندێکیان لە نێو دەقدا کاردەکەن و هەندێکی تر لە دەوروبەری ئاخاوتن کە بە گشتی دەبنە دوو جۆر :

**١-٢-٣-٢-١- نیشانە دەوروبەرە زمانییەکان :**

ئەم نیشانانە دەگرێتەوە کە لە رێگای هێماکان و دەوروبەرە زمانییەکەوە، واتە تێکست وەردەگیرێن (٣٢)، پەیوەندی وشەکان بە وشەکانی ترەوە دەگرێتەوە، واتە (Syntagmatic Relations) نەك دەوروبەری ئاخاوتن (٣٣) بە واتایەکی تر پەیوەندی ئاسۆیی نێوان وشەکان دەگرێتەوە و لە سنووری سیمانتیکدا واتامان بۆ رووندەکەنەوە، بەم پێیە نیشانە گرنگییەکی زۆری هەیە لەم ئاستەدا، چونکە تەمومژ زیاتر لەم ئاستەدا بەدیدەکرێت، جا بۆ ئەوەی رستەکان بواری پرسیار نەهێڵێتەوە ئەوا نیشانەکان بەکار دەهێنرێت بۆ روونکردنەوەی واتای رستە و خستنە رووی مەبەست، ئەم جۆرەی نیشانەکان بە زۆری بە ئاشکرایی دەردەبڕێت و دەبێتە چەند جۆرێك :

**أ- خوازە و خواستن و درکە :**

لێرەدا تەنها نموونەیەیەکی خواستن وەردەگرین و نموونەکانی تر لە بەشی دووەم زیاتر رووندەکەینەوە، وەك : – لە روخساری لەتیفی: گوڵ،لە جەعدی عەنبەرینی دڵ .

دەجۆشێت و دەبارێ، ئەو گولستان، ئەم دڵستان . (**مەحوی**)

شاعیر لەم دێرە شیعرەش وێنەیەکی ڕوونبێژی لەسەر بنەمای (خواستن) دروست کردووە :

لێ خواستراو: گوڵ . بۆ خواستراو: یار (کە دەرنەکەوتووە). نیشانەی خواستن (روخساری لەتیف) واتە دەم وچاوی جوان (٣٤).

**ب- نموونە :**

نموونە هێنانەوە نیشانەن بۆ رونکردنەوە و سەلماندن، وەك : (ناو) : وشەیەکە بۆ ناونانی کەسێك یا شتێك بەکاردێت وەك : شاسوار، گەلاوێژ، هەڵووژە ....هتد .

ج- گەڕانەوەی راناو : گەرانەوەی راناوەکان بۆ کەس و شتەکان دەبنە نیشانە بۆ روونکردنەوەی وشە قورسەکە وەك :- کوا دۆغەواکە با بیخۆین .

لەم رستەیە گریمان ئەگەر یەکێك نەزانێت دۆغەواش چییە ئەوا دەزاندرێت، کە خواردنێکە و دەخورێت، ئەمیش لە رێگای راناوی (ین) کە دەگەڕێتەوە بۆ (دۆغەوا) و واتاکەی رووندەکاتەوە.

**د- خاڵبەندی :**

خاڵبەندی بە هەموو جۆرەکانییەوە نیشانەیەکە بۆ روونکردنەوەی واتا، بێگومان لە ئەنجامی گۆڕینی ئاخاوتن بۆ زمانی نووسین ناتواندرێت دەقاودەق وەربگێردرێت، بەڵکو کەلێنێك دروست دەبێت ئەم کەلێنانەش لە رێگای خاڵبەندییەوە هەندێکجار چارەسەر دەکرێت، بۆ نموونە ئاوازەی رستە

ناتواندرێت نیشانەی بۆ دابنرێت، بەڵام بۆ رستەیەکی پرسی دروستکراو بە ئاوازە، نیشانەی پرسیار (؟) دەبێتە نیشانە کە رستەکە پرسە، وەك :- باوکم بۆ جەژن دێتەوە ؟

**هـ- هاورێیەتی** Collocation **و بەیەکەوە هاتن** Associative **:**

ئەو پەیوەندییە هاورێیەتیانە دەگرێتەوە، کە لە رێگای (و) ی پەیوەندیەوە دێتە کایەوە (٣٥) بۆ نموونە رستەیەکی وەك :- شیرین و دیدارم بینی . بەستنەوەی شیرین و دیدار دەبێتە نیشانە، کە پەیوەندی هاورێیەتی یان دڵداری لە نێوانیاندا هەیە.[بەیەکەوە هاتن Associative نیشانەیەکی هۆشەکییە ئەم بەیەکەوە هاتنانە دەگرێتەوە، کە کۆت بۆ یەکتر دادەنێن] (٣٦) وەك بەیکەوە هاتنی (ناو و ناو) وەك: ( ئازاد و نەوزاد) یان (ناو ئاوەڵناو) وەك: (گوڵی جوان)، ( فیرث Firth ) پێی وایە واتای ئەم بەیەکەوەهاتنە لە ئاستی رێکەوتنەوە دەبێت دوورە لە چەمك (Concept) و بیرۆکە (Idea)، [بۆ نموونە یەکێ لەواتاکانی (شەو) ئەوەیە لەگەڵ (تاریك) ی دێت و یەکێ لە واتاکانی (تاریك) یش ئەوەیە بەدوای (شەو) دا دێت] (٣٧) بۆ نموونە رستەی :- مووچەکەی وەرگرت.

دەزانین کەسەکە فەرمانبەرە،چونکە مووچە وەرگرتن بەیەکەوە هاتنی لەگەڵ فەرمانبەر یا مامۆستایە...هتد. نەك کرێکار .

**و- روونکردنەوە :**

بۆ روونکردنەوە و نەهێشتنی کەلێن بۆ پرسیار بەکاردێت وەك :- زەویەکەم <u>بە تراکتۆر</u> کێڵا.

بە تراکتۆر وەك نیشانەیەك بۆ روونکردنەوە هاتووە و ئەگەری کێڵان بە شتی تر رەت دەکاتەوە.

**ز- جێگەیی** (٣٨) :

نیشانەی تایبەتوونە و شوێن و جێگا دیاریدەکات (٣٩) وەك : قەرەداغی، هەولێری، سابڵاغی، ...هتد، کە نیشانەیە بۆ شوێن .

**ح- وەسف :**

خستنەرووی شێوە و رەنگ و بارودۆخ و چۆنیەتی و چەندێتی شت دەردەخات، بۆ نموونە کاتێ دەگوترێ : - چەرمی رووی هێندە قایمە شمشێری میسری نایبڕێ

بێ بەکەوشی کەی دەمێنێ تا قیامەت نادڕێ (**شێخ رەزا**) (٤٠) .

ئەم وەسفەی شاعیر دەیکات نیشانەیە بۆ قایمی، چونکە چەرمێك شمشێر نەیبڕێ و بکرێتە پێڵاو نەدرێ بێگومان زۆر قایمە .

**گ- پەیوەندی واتایی :**

پەیوەندی هاوواتایی یان دژواتایی یان هەر پەیوەندییەکی تر دەبێتە نیشانە بۆ رونکردنەوەی واتای وشە قوڕسەکە وەك [(نسرێن) لەم رستەیە لە رێگای وشە هاوواتاکەی (خەم) رووندەبێتەوە] (٤١) وەك :

- ئەگەر ژنی گەورەی میری وادەبینی

بانگ دەکا:برایم چاکە مەکێشە خەم و نسرینێ. (**فۆلکلۆر**)

**ی- پێناسە :**

پێناسە و ڕوونکردنەوە دەربارەی شتێك یان کەسێك دەبێتە نیشانە بۆ ڕوونکردنەوەی واتاکەی و زیاترکردنی زانیاری دەربارەی وەك :

- پرتەقاڵ جۆرێکە لە مزرەمەنی و شێوەیەکی خڕی هەیە و ڤیتامین (C) ی تێدایە .

ئەم زانیارییانەی کە لە هەواڵ دەربارەی (پرتەقاڵ) دەدەن دەبنە نیشانە و واتاکەی ڕووندەکەنەوە .

**ك- واتای گشتی :**

واتای گشتی دەقێك یان ئاخاوتنێك بەسەر یەکەوە، واتای شارەوەی وشە قورسەکانمان بۆ ڕووندەکاتەوە .

**ل- نیشانە شێوازییەکان :**

ئەو نیشانانەن کە زانیاریمان دەربارەی ناسنامەی قسەکەر و گوێگر دەداتێ، وەك: پلە وپایەی کۆمەڵایەتی و شوێنی جوگرافی و پلەی خوێندەواری و ئیش و کاری و جۆری زارەکە و پلەی پێش کەوتوویی زارەکە وەك ئەوەی زاری بازاڕییە یان فەرمیە یان ئەدەبییە...هتد.[لەگەڵ جۆری زمانەکە واتە زمانی شیعرە یا پەخشانە یا زانستە.....هتد] (٤٢) .

هەڵبژاردنی وشەکان دەبنە نیشانە بۆ دیاریکردنی ناسنامەی ئاخێوەران، بۆ نموونە بەکارهێنانی وشەیەکی وەك (خاتوو) بۆ ئافرەتێك دەبێتە نیشانە، ئافرەتەکە لە چینی بەرزە یان ڕێزی لێگیراوە، یان وشەیەکی وەك (بەعە) دەبێتە نیشانە قسەکەر منالە، نیشانانەکان زۆر جار زانیاریمان دەربارەی پلەی خوێندەواری و ئیش و کاری و دیالێکتەکەی و....هتد. ئاخێوەران پێدەدات، بۆ نموونە وشەی (بەرف) سەرەڕای واتا هۆشەکییەکەی کە ( + سارد + سپی + بەستوو ) زانیاری ئەوەش دەدات کە بەکارهێنەرەکەی سەربە دیالێکتی کرمانجی سەرووە، یان ڕستەیەکی وەك :

- کراسەکەم بە دوو پارەی کەسك کڕی .

بەکارهێنانی ئەم وشەیە دەبێتە نیشانە کە ئاخێوەر نەخوێندەوارە و زمانەکەی بازاڕییە .

**١-٢-٣-٢-٢- نیشانە دەوروبەرییە بارییەکان** Situation Context :

ئەم نیشانانەن کە پەیوەندییان بە چۆنییەتی دەوروبەرە Context Circumstantial هەیە، نیشانەکان لەم ئاستەدا ڕۆڵی خۆیان هەیە بۆ کورتبڕی ئاخاوتن و بارکردنی ڕێژەیەکی زۆر لە واتا لە گوتنێکدا.

**١-٢-٣-٢-٢-١- شارەزایی لێکدەرەوە :**

ئەمەش پەیوەندی بە توانستی Competence لێکدەرەوە هەیە بۆ تێگەیشتن و لێکدانەوە،[توانست توانای تاکە لە بەرهەمهێنانی ڕستە و تێگەیشتنی، کە پێشتر گوێی لێنەبووە] (٤٣) گوێگر بۆ لێکدانەوەی تێگەیشتن پێویستی بە دوو توانستە :

أ- توانستی قسەکەر بۆ زانینی زۆر لە وشەی فەرهەنگی و جیاکردنەوەیان لەیەك بەکارهێنانی بە شێوەیەکی گونجاو لەناو ڕستە و گوتندا. ئەم توانستە تەنها پەیوەست دەبێت بە زمانێکی تایبەت .

ب- توانستی قسەکەری زمان لە تێگەیشتنی پەیوەندییە لۆجیکییەکانی نێوان کەرستەکانی ناو ڕستە و گوتن لەگەڵ ئەو توانستەی کە ڕستەیەکی ئاسایی و نائاسایی لەیەك جیادەکاتەوە،[ئەم توانستە

تایبەت نییە بە زمانێك هەموو قسەكەرێكی زمان پێویستی پێیەتی] (٤٤) .بۆ نموونە رستەیەكی وەك :

– ماستەكە پشیلەكەی خوارد.

ئەم رستەیە هەرچەندە لەرووی ڕێزمانی و ڕێكەوتنەوە گونجاوە، بەڵام هەموو قسەكەرێكی زمان درك بەوەدەكات، كە پەیوەندییە لۆجیكییەكانی نێوان كەرەسەكان گونجاو نییە،بە واتایەكی تر دەزانێت كە وشەیەكی وەك: ماست ناشێت ببێتە بكەر. زۆرجاریش قسە پێكەرانی زمان ئەو زانیاریانە پردەكەنەوە، كە نەدراون لە رستە بە پێی تیۆری ناوەخنكردن Redundancy، كە هۆیەكی گرنگە بۆ لابردن و ئابووری زمان بۆ نموونە كە دەڵێین : – كورەكە هات.

دەزانین، كە (+ كوڕە + مرۆڤە +نێرە ) كە بۆ ئێرە هات (٤٥). ئەم زیادەیە كە هەڵئاوسانی واتایی دروست دەكات واتای وشە زیادەكان دەبێتە نیشانە، كە قسەكەرەكەی هەڵگری ئەم زمانە نییە وەك :

– مەڕێكی مێ سەربڕە.

وشەی مێ زیادەیە و ئەو زیادەیە دەبێتە نیشانە كە قسەكەرەكە زانیاری ئەوەی نیە كە (مەڕ) مێیە و نێرەی مەڕ (بەران) ی پێدەگوترێت .

١-٢-٣-٢-٢-٢- **نیشانە بارییەكان** ( Situation ):

بۆ ئەم نیشانەیە دەبێت بگەڕێینەوە بۆ دەوروبەر، بۆ نموونە بۆ زانینی و ساغكردنەوەی سەرخۆشی یەكێك پێویستیمان بەم نیشانانە دەبێت (نارێكی قسەكەی، گۆڕین لە دەربڕین، بۆنی عەرەقی لێبێت، دەڕشێتەوە، بوونی عەرەق یان پاشماوەی لەم شوێنەكە، بەرزبوونەوەی ڕێژەی كهول لە خوێنی....هتد) .

١-٢-٣-٢-٢-٣- **نیشانە فۆنیمە ناكەرتییەكان** Supra Segmental Phoneme

فۆنیمە ناكەرتییەكان ڕۆڵی نیشانە دەگێرن كە بریتین لە :

**أ- نیشانەی وەستان:**

جۆرێكە لەبێدەنگی كە لە نێوان وشەیەك و وشەكی تر یان دەنگێك و دەنگێكی تر یان لەنێوان گرێ یەك وگرێ یەكی تر یان رستەیەك و رستەیەكی تر دەبێنرێت.[وەستان فۆنێمێكی ناكەرتیە واتا دەگۆڕێت] (٤٦) وەستان پێنج جۆرە: (هەڵس،كەوت،كاتی،پۆزەتیف، نیگەتیڤ):

– وەستانی هەڵس لەرستەی پرسیاردا بەكارهێنانی هەیە و بەرزبوونەوەی ئاوازەی لەگەڵدایە وەك : – چ دەكەی ↑ ؟

– وەستانی كەوت لە كۆتایی رستەی هەواڵدان دا دێت وەك : ڕۆنیا هاتەوە ↓

– وەستانی كاتی لە ناوەراستی گوتن دێت گۆڕان لە ئاوازە ڕوونادات وەك: یارا ← مامۆستایە

– وەستانی پۆزەتیڤ (+) دەكەوێتە نێوان دووپارچەی وشە بۆ جیاكردنەوەی واتا وەك :

– دار+ سێو دەڕوێنم .

– [وەستانی نێگەتیڤیش (–) دەكەوێتە نێوان دەنگێك و دەنگێكی تر، كە بەدوایەوە دێت و زۆر هەستی پێناكرێت وەك:(د– ا–ر)] (٤٧).

وەستان نیشانەیەكە بۆ جیاكردنەوە واتای رستە و دۆزینەوەی واتا بۆ نموونە ڕستەیەكی وەك :

– ئەو کچە بەنازە . دوو واتای هەیە : أ– (ئەو کچە ناز دەکات). ب– (ئەو کچە ناوی بەنازە) (٤٨) .
زۆرجاریش چەمکی دژیەکی دەردەخات بۆ نموونە لە رستەیەکی وەك :– نەکەی دەتکوژم .
واتە : أ– ئەگەر بیکەی دەتکوژم. ب– ئەگەر نەیکەی دەتکوژم .

لەم بارەدا برگەی یەکەمی نەکەی کورتدەکرێتەوە برگەی دووەم لەپڕ دەوترێ وەستانێك دوای نەکەی هەیە وە برگەی سێیەمی دەتکوژم بەرزبوونەوەیەکی خێرای پێوەدیارە (نەکەی↑دەتکوژم ) بۆ دەربڕینی مەبەستی دووەم وەستان دوای وشەی نەکەی نییە، بەڵکو نزمبوونەوەی خێرای پێوە دیارە و برگەی سێیەمی دەتکوژم هێزی خراوەتەسەر (٤٩). ئاخێوەر لەکاتی ئاخاوتن لە رێگای وەستان بۆ گوێگر دەردەخات، کە لەو شوێنەی لێی دەوەستێت شوێنی دودڵی و بیرکردنەوەیە (٥٠) وشە دەربڕاوەکانیش جێگای گومانن .

**ب- نیشانەکانی ئاوازە :**

ئاوازە چ وەك ( Melody ) چ وەك ( Intonation ) نیشانەیەکە بۆ دۆزینەوەی واتا و لەیەك جیاکردنەوەی رستەکان، زۆر جۆری رستە بە ئاوازەوە دەناسرێتەوە، بۆ نموونە ئاوازەی رستەی هەواڵدان چینئاوازەیەکی ئاساییە ودەکەوێتە نێوان تەواوبەرز و زۆر نزم، کە تا رادەیەك ئاسۆییە وەك :– من خراپم .

رستەی پرسیار ئاوازەکەی تێکەڵە لە نێوان چینئاوازی بەرز و نزم و لە کۆتایدا نزم دەبێتەوە واتە لەو شتەی کە قسەکەر دەیەوێت پرسیاری دەربارەوە بکات ئاوازەکە بەرزدەبێتەوە وەك:– من خراپم ؟
ئاوازەی پرس زۆرجار جێگای ئامرازەکانی پرسی گرتۆتەوە (٥١)، بۆ نموونە رستەی:
–بژار هات ؟ ئەوە دەگەیەنێت:– ئایا بژار هات ؟

لە رستەی سەرسورمانیش چین ئاوازەی رستە بەرزە لە سەرەتاوە ئەمەش لە ئەنجامی هەست دەربڕینی کتوپڕ دێتە ئاراوە. وەك :– من خراپم !

لە رستەی فەرماندانداا چینئاوازەی رستە لە جۆری نزمە بەرزە (٥٢) وەك:– برۆ دەرەوە .

مارتنت پێی وایە ئاوازە چەند ئەرکێکی ئاڵۆز دەبینێت، بەڵام لە هەموویان بەسوودتر و راستەخۆ ئەرکی دەربڕینە (Expressive)، کە لەبواری کاریگەری خستنەسەر گرنگییەکی زۆری هەیە (٥٣) .

ئەم ئاوازانە لە نێوان هەڵس و کەوت دا دەبن و هەریەکەیان دەبنە نیشانە بۆ جۆرە دەربڕین و شێوازێك بۆ نموونە :

– ئاوازەی کەوت : دوای پێش کۆتایی هێنانی قسەکردن بەکاردێت و بەکاریش دێت بۆ ئەری و نەری و مەرج و نزا و پرسیاری بە ئاوازە .

– ئاوازەی هەڵس : بەکاردێت بۆ پرسیارکردن لەرێگای ئامرازی (ئایا) .

– ئاوازەی ئاسۆیی : ئاوازەیەکە لە نێوان بەرز و نزم وەك ئەم جۆرە ئاوازەی، کە قسەکەر دوای وەستان بەکاری دێنێت پێش تەواوکردنی قسەکەی یان وەستان لە رستەی مەرج پێش وەڵامی مەرجەکە (٥٤) .

ئاوازە جگە لە بوونی بە نیشانە بۆ دەرخستنی جۆرەکانی رستە، دەبێتە [نیشانەش بۆ دەرخستنی باری دەروونی کەسەکە لە خۆشی و ناخۆشی و توورەیی و سوکایەتی پێکردن ...هتد] (٥٥) ئاوازە

زۆرجار بە پێی باری دەروونی قسەکەر دەگۆڕێت لە بارێکەوە بۆ بارێکی تر بە تایبەتیش درێژکردنەوەکان، بۆ نموونە :

– درێژکردنەوەی پۆزەتیف : بەکاردێت لەگەڵ دەربڕینێکی سۆزداری وروژێنەر وەك گوتار یان وانەگوتنەوە یان دوای هاوارکردنی تووڕەیی .

– درێژکردنەوەی ڕێژەیی : بەکاردێت لەگەڵ دەربڕینی ئاسایی.

– درێژکردنەوەی نێگەتیف : بەکاردێت لەگەڵ دەربڕینێکی سۆزداری، کە دابەزینی چالاکی لەشی بەدواوە دێت وەك دەربڕینی نائومێدی و دڵتەنگی یان ئاخاوتنێکی دووکەسی نەیانەوێت کەسی سێیەم تێبگات .

لایەنی بایەلۆجی تاکەکان جیاوازن لە رووی فراوانی ژووری لەرینەوەکان یان جیاوازی لە تاڵە ژێیەکان ....هتد (٥٦) .دەنگەکان لە زماندا تایبەتمەندی کەسەکە دەردەخەن و دەبنە نیشانە بۆ ناسینەوەی ناسنامەی کەس (٥٧)، کە پێی دەگوترێت مۆری دەنگی، گۆرانکاری لە بەرزی و نزمی پلەی دەنگ و خێرایی قسەکردن و دەسگرتن بەسەر چۆنیەتی دەربڕینی دەنگ هەموویان تایبەتی دەنگی پەرەزمانین para-linguistics (٥٨) و زۆر تایبەتمەندی کەسیمان لە تەمەن و رەگەز و نەخۆشی و باری دەروونی بۆ ڕووندەکاتەوە و لە ڕێگای دەنگەوە دەتوانین بیانناسینەوە (٥٩). بە تایبەتی ئاوازەی دەربڕین، کە هەڵچوونەکانی تیارەنگدەداتەوە (٦٠)، بۆ نموونە لە ڕێگای دەنگەوە دەتوانین ژن و پیاو منداڵ و گەورە نەخۆش و ساغ لە یەکتر جیابکەینەوە. جگە لەمەش دەنگەکان بۆمان ڕووندەکاتەوە ئایا کەسەکە زمانی دەگیرێت یان نەخۆشی زمانی هەیە یان هەموو دەنگەکان بە شێوەی دروست دەردەبڕێت یان نا، جگە لەمانەش چۆنییەتی دەربڕینی دەنگەکان بۆ ڕووندەکاتەوە کەسەکە لە چ بارێکی دەروونیدا دەژی، کەیف خۆشە یان غەمبار یا نەخۆشی دەروونی هەیە یان نا، بۆ نموونە [کەسێکی نائاسوودە بە ئاوازەیەکی بەرز و خێرا قسەکانی دەردەبڕێت] (٦١) هەروەها لە ڕێگای دەنگەوە دەتوانین زمانی قسەکردنی ئاخێوەر دەستنیشان بکەین بزانین زمانی دایکە یان زمانی دووەمە...هتد.

**ج- نیشانەی هێز** (Stress) :

هێز بەشێوەیەکی گشتی سێ جۆرە : ( هێزی وشە،هێزی رستە،هێزی بەرامبەری )، هەریەك لەم هێزانەش دەبنە نیشانە بۆ ناسینەوە و روونکردنەوە، هێزی وشە ئەو هێزەیە دەخرێتە سەر وشە ئەگەر بەتەنها بێت، ئەمیش بەپێی برگە شوێنەکەی دەگۆرێت، هێزی رستە ئەو هێزە سەرەکیەیە کە رستە وەریدەگرێت و بەپێی جۆری رستەکان دەگۆڕێت،[هێزی بەرامبەری ئەو هێزەیە کە بەمەبەست دەخرێتە سەر یەکێ لە وشەکانی رستە](٦٢) هێز نیشانەیەکە بۆ جیاکردنەوەی وشە و رستە و واتاکانیان وەك: برایەتی (برایەتی) ناوی واتایی، هێز لەسەر دوا برگەیە. برایەتی (برا یەتی) واتە: ئەو برای ئەوە، هێز لەسەر برگەی یەکەم (٦٣). زۆرجار هێز بابەت دەست نیشان دەکات بۆ نموونە لەرستەی :– ئازاد دوێنێ هات.

ئەگەر هێز لەسەر وشەی ئازاد زیادکرا رستەکە دەبێتە وەڵامی (کێ دوێنی هات ؟) .وە ئەگەر هێز لەسەر وشەی دوێنی زیادکرا وەك :

ئازاد دوێنی هات

ئەوا دەبێتە وەڵام بۆ رستەی (ئازاد کەی هات) وە ئەگەر هێز لەسەر وشەی هات زیادکرا وەك :

ئازاد دوێنی هات

ئەوا دەبێتە وەلام بۆ رستەی ئازاد دوێنێ چی دەکرد ؟

وە [ئەگەر هێزێکی زیاتر لەوەی سەرەوە خرا سەر وشەی ئازاد وەیا دوێنێ ئەوە پرسیار و جەختکردنەوە دەگەیەنێت] (٦٤) وەك:

ئازاد دوێنی هات ئازاد دوێنی هات

سەرەڕای ئەمانەش هێز خستنە سەر وشە لە کاتی دەربڕیندا واتای گرنگی و جەخت کردنە سەر وشەکە دەدات (٦٥).

١-٢-٣-٢-٢-٤- **نیشانە ئاماژەییەکان** (٦٦) :

نیشانە پەرە زمانییەکان دەگرێتەوە وەك: پەنجە هەڵشەقاندن، نیشانەی هەڕەشەیە و جولانەوەی سەر بەم لاو بەم لا، نیشانەی ناڕازیبوونەوە و سەرلەقاندن، نیشانەی بەردەوامی پێدان و هەم ئاهەنگییە لەگەڵ ئاخێوەر و .....هتد. دەوروبەر لە رێگای نیشانەکانەوە زۆر شتمان بۆ روونەکاتەوە لە پلەوپایە و هێز و دەسەلات و دەوڵەمەندی و هەژاری و خوێندەواری و رۆشنبیری و ...هتد. هەروەها بوونی ئەستێرەی سەرشان نیشانەی پلەوپایەیە، جل و بەرگی جوان و ئۆتۆمۆبیلی گرانبەها و بوونی خشل و زێر و ئەڵماسی زۆر نیشانەی دەوڵەمەندیە .....هتد . جگە لەمەش نیشانە مادییەکانیش دەگرێتەوە کە پێشتر ئاماژەمان بۆکردووە .

## بەشی دووەم : رۆڵی نیشانە لە روونکردنەوەی واتا

**٢-١- نیشانە و واتا :**

نیشانە ئەنجامی کۆتایی پەیوەندی نێوان دوو رووداو دەردەخات، جا پەیوەندییەکە یان هۆییە، یان کۆمەڵایەتییە. بۆ نموونە :

**٢-١-١- هۆشەکی:**

ئەم جۆرە نیشانانە، پەیوەندییەکی هۆیی لە نێوان نیشانە و واتاکەیدا هەیە و لە رێگای هەڵێنجانەوە بەدەست دێت وەك: بوونی پاشماوەی سوتان لە شوێنێك دەبێتە نیشانە کە ئاگری تیاکراوەتەوە و شوێنی نیشتەجێی کەسانی تربووە هەروەك شوێنەوارناسەکان پشتی پێدەبەستن.

**٢-١-٢- کۆمەڵایەتی:**

ئەم نیشانەیە لە ئەنجامی ڕێکەوتنی کۆمەڵایەتییەوە هاتووە و جێگیر نییە و لە گۆڕاندایە،[ بۆ نموونە کڕینی بەرانێك لە ڕۆژانی جەژنی قوربان ئەوە دەگەیەنێت، کە ئەم بەرانە بۆ قوربانیە، لەوانەشە بۆ قوربانی نەبێت] (٦٧)، کەواتە ڕاستییەکەی کۆتایی نییە. نیشانکراو (Marked) و نیشان نەکراو (Unmarked) لە ئەنجامی ئەم ڕێکەوتنە کۆمەڵایەتییە دێتە ئاراوە، کە دەبنە نیشانە بۆ ساغکردنەوەی واتا، بۆ نموونە کە دەڵێین :- شۆفێری تاکسیە کە هات.

ئەوا دەزانین کە شۆفێرەکە (+مرۆڤ +هەراش + نێر)، چونکە کاری تاکسی لێخوڕین لە کۆمەڵگای کوردی نیشانکراوە بۆ پیاو نەك بۆ ژن و ئافرەت .

**٢-٢- ڕۆڵی نیشانە لە ڕوونکردنەوەی واتادا:**

ئەو نیشانانەی کە ڕۆڵ دەبینن لە لێکدانەوەی واتای سیمانتیکی دەقی نووسراو بریتین لە بەشێك لە نیشانە مادییەکان وەك وێنە و نیشانە هۆشەکییەکان و نیشانە ڕێزمانییەکان و نیشانە واتاییە ئاشکراکان، ئەوانەی کە لە واتای پراگماتیکیشدا ڕۆڵ دەبینن لە ئاخاوتن و گفتوگۆ بریتین لە، نیشانە مادییەکان، هۆشەکییەکان، واتاییە شارەوەکانی وەك: ئاوازە و هێز و وەستان و نیشانە ئاماژەییەکان.....هتد، کە لە دەوروبەردا ڕوون دەبنەوە. بە شێوەیەکی گشتی واتا دووجۆرە :

أ- واتای فەرهەنگی ( واتای سیمانتیکی) :

واتای وشە و کاریگەرییە ڕێزمانییەکان دەگرێتەوە، کە لە ڕێگای نیشانەکانی دەوروبەری زمانی لێکدەدرێتەوە و لە بەشی یەکەم ئاماژەمان بۆکرد . نیشانەکان ڕۆڵێکی گرنگیان هەیە لە دۆزینەوە و ڕوونکردنەوەی واتای سیمانتیکی و ڕەواندنەوەی لێلی بۆ نموونە ڕستەیەکی وەك :- ئازاد بەدوای سەرچاوە دا دەگەڕێت.

ئەم ڕستەیە ڕستەیەکی تەمومژاوی و لێلە، چونکە هیچ نیشانەیەك نییە واتاکەی ڕوونبکاتەوە، کە مەبەست لە وشەی سەرچاوە کامە سەرچاوەیە، چونکە سەرچاوە چەند واتایەکی هەیە وەك سەرچاوەی ئاو، سەرچاوەی پارە، سەرچاوەی کتێب،....هتد. جا ئەگەر بوترێت :

- ئازاد بەدوای سەرچاوەی ئاو دەگەڕێت. ئەوا (ئاو) نیشانەیە و واتای سەرچاوە ڕووندەکاتەوە و واتاکانی تر ڕەتدەکاتەوە، کە تەمومژی دروستکردبوو.

ب- واتای پراگماتیکی ( واتای دەوروبەر) :

واتای پراکتیکی دەوروبەر دەگرێتەوە و لە ڕێگای نیشانە دەوروبەرییەکانی ئاخاوتن لێکدەدرێتەوە (٦٨).دەربڕینەکان دەبنە دووبەش هەندێکیان واتاکانیان ڕوون و ئاشکرایە و پێویستیان بە نیشانە نییە و هەندێکی تریش لە ڕێگای نیشانەکانەوە ڕووندەکرێنەوە، لەوانەش [شیعر و ئیدیەم و پەندی پێشینان هەندێ لە ئاخاوتنەکان] (٦٩) ئێمەش لێرەدا دوو نموونە وەردەگرین کە بریتین لە :

**٢-٢-١- ڕۆڵی نیشانە لە لێکدانەوەی دەقی شیعری:**

بەکارهێنانی نیشانە لە زمانی شیعر دەگەڕێتەوە بۆ هەندێ هونەری ڕەوانبێژی لەمانەش خوازە و خواستن و درکە، کە شاعیران گرنگی دەدەن وەك نیشانەیەك دەیخەنە ڕوو تا ئەو مەبەستە بگەیەنێت کە ئەو دەیەوێت :

٢-٢-١-١- **خواستن :**

بریتیە لە وشەیەك دوو مانای هەبێت یەکیان مانای فەرهەنگی ئەویتر مانای لە ناو ڕستە، جا دەبێت پەیوەندی نێوان ئەم دوو واتایە لێکچواندن بێت، بەڵام [جیاوازی لەگەڵ لێکچواندن ئەوەیە دەبێت یەك لە بنەما سەرەکیەکەی (لێچووبێت یان لەوچوو) دەردەکەوێت. لەگەڵ ئەمەشدا نیشانەیەك لە ڕستەکەدا هەیە، ئاماژە بۆ واتای مەبەست دەکات] (٧٠) وەك:

- چاوەکەم ئیمرۆ لە گوڵشەن گوڵ بە عیشوە خۆی نواند

نەك نمەك گیریم بە مەرگی تۆ قەسەم هیچ نەمدواند (حەریق) (٧١) .

لەم دێرە شیعرەدا مەبەستمان لە (گوڵ) مرۆڤە و نیشانەشمان (عیشوە) یە، کە نیشانەی خواستنە چونکە عیشوە دەدرێتە پاڵ مرۆڤ (٧٢).

٢-٢-١-٢- **خوازە :**

بریتیە لە بەکارهێنانی وشەیەك بۆ مانایەك کە جیابێت لە مانای ئەسلی وشەکە بە مەرجێ پەیوەندییەك لە نێوان هەردوو وشەکەدا هەبێت و ئەم پەیوەندییەش لێکچواندن نەبێت (٧٣) وەك ئەم دێرە شیعرەی هەردی کە دەڵێت :

- وانەزانی دەستی غەم یادت لە دڵدا دەرئەکا

ئەشکی خوێنینم دەلیلە بۆ کەسێ باوەڕنەکا (هەردی) (٧٤).

لێرەدا شاعیر (ئەشکی خوێنینم) واتە فرمێسکی خوێناوی کردۆتە نیشانە بۆ نیشاندانی غەم پەژارەی خۆی بۆ یارەکەی .

٢-٢-١-٣- **درکە :**

درکە دەربڕینی بیرۆکەیەکە بەشێوەیەکی ناڕاستەوخۆ لە ڕێگای چەند وشەیەك ئاماژە بۆ واتای مەبەست دەکات (٧٥)، بە واتایەکی تر بریتییە لە باسکردنی سیفەتی یان شتێ بە شێوەیەکی ناڕاستەخۆ بە شێوەی دەستە واژە یان ڕستەیە واتایەکی دروستی و فەرهەنگی دەداتێ، لە هەمان کاتدا ئەو ڕستەیە مانایەکی تر و بیرێکی ترت دەداتێ ڕستەکە دەبێتە درکە بۆ مانای دووەم :

- لێم گەڕێ با گۆشەگیربم دەستە ئەژنۆ کەف زەنان

گێژەلولکەی بای نەدامەت تاریکرد صەفحەی جیهان. (سالم) (٧٦) .

لەم دێرە شیعرەدا (کەف زەنان) واتە (دەست لێکدان) (درکە) وەیا نیشانەیە بۆ خەفەت خواردن.

جگە لەم نیشانە دیارانە نیشانەکانی تریش سوودی لێدەبینرێت وەك :

- هەناسەم زولفەکەی لاداو مەیلێکی نەکرد چـــاوی

نەسیم ئەنگووت وشەو ڕابورد نەرگس هەرلەخەودایە (نالی) (٧٧) .

شاعیر دەڵێت: (مەیلێکی نەکرد چاوی) دیارە مەیل و ئارەزوو تایبەتە بەمرۆڤەوە و زیاتر پەیوەستە بەدڵ ودەروونەوە. چاویش یەکێکە لە ئەندامەکانی مرۆڤ. لێرەدا شاعیر مەیل وئارەزووی وەرگرتووە و لەبری ئەوەی بیداتە پاڵ یار داویەتە پاڵ چاو، کە یەکێکە لە ئەندامەکانی یار، کە پەیوەندی بەش لە گشت و لە رەوانبێژیشدا پێی دەووترێت (درکە لە هاوگری نسبەتدا) . لێرەدا شاعیر دەڵێت : مەیلێکەی نەکرد چاوی، مەبەستی ئەوەیە لەگەڵ ئەوەشدا کە زۆر لێی نزیك بۆتەوە تەنانەت بای هەناسەی زولفی ڕەشی وەك شەوی لەسەر ڕووی پڕشنگداریا لابردووە، کەچی یار ئارەزووی نەبووە و وەلامی نەداوەتەوە......یاخود بەشێوەیەکی تر بڵێین مەیلی ڕابوارنی نەبووە لەگەڵ شاعیردا بۆیە چاوی هەڵنەهێناوە .

شاعیر لە نیووە دێڕی دووەمدا وشەی نەرگسی هێناوە و لە شوێنی چاوی داناوە.بەهۆیەوە وێنەیەکی هونەری لەسەر بنەمای خواستن دروست کردووە .

لێخواستراو : گوڵی نێرگز، بۆخواستراو: چاو (دەرنەکەوتووە)، نیشانەی خواستن : هەر لەخەودایە، خواستنەکە خواستنی ئاشکرای ڕاستەقینەی نەژادییە، لەڕووی بەهێزی خواستنەکەش دەکەوێتە پلەی دووەم (خواستنی پەتی )، چونکە لەم دێڕە شیعرەکەدا شتێك هاتووە لەگەڵ بۆ خواستراودا دەگونجێت ئەویش (هەرلەخەودایە )کە پەیوەستە بەچاو و بۆی خواستراوە. ئەگەر بێت و لەم دەقە شیعرییە وردبینەوە ئەم شیعرە وەك هەواڵدانێك دێتە بەرچاو بۆ لێکدانەوەی ئەم شیعرە دەبێت چەند پرسارێك لەخۆمان بکەین پشت بەستوو بە چەند نیشانەیەك وەلامە درووستەکان بخەینە روو:

١- شاعیر چ پەیوەندییەکی بە کەسی نووستووەوە هەبووە ؟

وەلامی ئەم پرسیارە دیارە پەیوەندیەك هەیە لە نێوان شاعیر و کەسی نووستوو دیارە ئەم پەیوەندیەش پەیوەندییەکی خۆشەویستییە، چونکە سەردانەکە لە درەنگی شەودبووە بەو نیشانەیەی کە کەسەکە نووستووە و لەخەوێکی قوڵدابووە.

٢- یارەکەی شاعیر بۆچی نووستووە و چاوەڕێ ی نەکردووە ؟

نووستن لە شەودا دوای تەواوکردنی کارەکان دێت و یارەکەی شاعیریش دیارە هیچ ژوانێکی خۆشەویستی لە نێوانیاندا نەبووە بۆیە نوستووە دواتریش یارەکەی هەر ئاسوودە بووە نەوەك لە دڵە راوکێ دابووبێت، ئەگەر وا بوایە تا درەنگانێکی شەو خەوی لێنەدەکەوت.

٣- رەگەزی کەسی نووستوو چییە؟

کەسی نووستوو دەبێ رەگەزی کچ بێت، چونکە زولف نیشانکراوە بۆ رەگەزی مێ لەوسەردەمەی زولف ی درێژ هی کچ و ئافرەت بووە.

٤- تەمەنی شاعیر چەندبووە؟

ئەگەر بگەڕێنەوە بۆ تەواوی پارچە شیعرەکە و دێرەکانی دواتر وەیا پێشووتر بۆمان دەردەکەوێت شاعیر لە چ تەمەنێکدابووە هەوەك دەڵێت :

- لە دووری تۆیە ئەی خورشیدی پڕتەوبەخشی شەوگەردان

کە (نالی) وا لە حالاتی میحاقی ماهی نەودایە (٧٨) .

نالی لەدووری یارەکەیدا کە وەکو ڕۆژێکی پڕشنگدارە و ڕووناکی بەمانگ وئەستێرەکان دەبەخشێت لەڕ ولاواز بووە و لەحالاتی میحاق دایە. میحاقیش ئەو کاتەیە، کە مانگ زۆر باریك دەبێتەوە بەڕادەیەك بەرەو ونبوون دەچێت ئەویش لە کۆتایی مانگی عەرەبیدایە وە لەسەرەتای مانگ دایە، بەلام لە کۆتایی مانگدا مانگ بەرە و ونبوون دەچێت، کە نالی خۆی پێ دەچووێنێ واتە لە تەمەنی پیری دایە، بەلام باریکی مانگ لە ڕۆژانی سەرەتای مانگدا ڕۆژ لە دوای ڕۆژ گەورەتر دەبێت ئەمەش حالەتی کچەکەیە کە لەوپەڕی گەنجیدایە، چونکە گەر وانەبێت نابێتە ئەو ڕۆژە پڕشنگ بەخشە. واتە نالی میحاقی بەدووشێوە بەکار هێناوە .

٥- تەمەنی کچەکە چەند بووە؟

بەپێی ئەو وەسفەی کە شاعیر دەیکات زولفی ڕەش و هەودای، کە هەر حەلقەیەکی دووسەد زنجیرە ودڵی عاشقان گیرۆدە دەکات و چاوی نێرگس وڕووی پڕشنگداری. جگە لەوە ئەو مانگەی کە بەرەبەرە گەورە دەبێت تەنیا لە کچێکی گەنج دا بەدی دەکرێت .

- سەری زولفت کە ڕشتەی عومری خضرە نیوە هودایە
چ هەودایە؟ کە هەر حەلقەی دووصەد زنجیری سەودایە !
بڕۆت تیغێکە و سمەی صەیقەل ومەسلوول ومووکارە
کە عیشوەی جەوهەرە ڕەمز و ئیشارەی ئاوی مەودایە
بە نەشئەی سستی ی ومەستیی وەها مەستوور و مەخموورە
نازانم خەو لەچاوتدا یە یا چاوت لەخەودا یە !
لە سایەی کوفری زوڵفت دڵ (فنافی النور)ی ئیمانە
مەڵێن ظوڵمەت خراپە وەصڵی پەروانە لە شەودا یە (نالی) (٧٩)

## ٢-٢-٢- ڕۆڵی نیشانە لە ڕوونکردنەوەی ئاخاوتندا :

مرۆڤ ئابوریانە قسەدەکات ئەو زانیاریانەی کە لە ئاخاوتن وەریدەگرین زیاترە لە رستە و گوتن، چونکە بواری شیکردنەوە و لێکدانەوەی زیاترە، بۆ نموونە لەم ئاخاوتنەی خوارەوە دەتوانین زۆر شتی شاراوە دەربخەین لە ڕێگای نیشانەکان :

أ- تکایە دەتوانی جارەکی تر بێیتەوە ئێرە هەر ئێستا ؟
ب- باشە گەورەم، بەلام دەبێت ئیمرۆ بڕۆمە سلێمانی .
أ- ئاااااا ؟ ئەی سێشەمە چۆنە ؟

بۆ ئەوەی واتای ئەم ئاخاوتنە لێکبدەینەوە دەبێت زۆر لە گریمانە و دەرکەوتە بکەین تا واتایەکی دروستمان دەست کەوێت، ئەم ئاخاوتنە ئەم ڕاستیانە دەگەیەنێت :

١- ئەم دەربڕینە نە سەرەتای قسەکردنە و نە کۆتایشە.نیشانەشمان ئەوەیە، کە نە بە سڵاو و پێشوازی و نە چاك و چۆنی دەستی پێکردووە و نە بە ماڵئاوای کۆتایی هاتووە.

٢- (أ) پرسيار له (ب) ناكات ئاخۆ پێیدەكرێت بێت یان نا، بەڵكو داوایە و دەیەوێت لە كاتی قسەكردن یەكسەر بچێتەوە لای .
٣- (ب) نایەوێت بڕواتەوە لای، چونكە كاری بۆ خۆی دۆزیوەتەوە لە ئایندە. بۆیەش (أ) داواكە دووبارە دەكاتەوە لەگەڵ گۆڕانی كات .
٤- (أ) دەیەوێت (ب) بگاتە لای خۆی، كەواتە (ب) لای (أ) نییە و نزیكیش نییە بگاتە لای، هەر خۆشی وای بۆ دەچێت داواكەی بە ئەریٚ و نەریٚ وەڵام بدرێتەوە و واش هەستدەكات داوایەكەی هاندەرە بۆ هاتنی (ب) و (أ) پلەوپایەی خۆی بەكارناهێنێت، نیشانەشمان (تكایە) یە كە بەكاریهێناوە .
٥- (أ) دەزانێت كە (ب) شوێنەكەی پێدەزانێت و (أ و ب) لە یەك شوێن نین و هیچ یەكێكیشیان لە سلێمانی نین.و (أ) وای بۆ دەچێت (ب) پێشتر چۆتە لای لەم شوێنەی ئێستای، بە نیشانەی (جارەكی تر بێیتەوە ) .
٦- ئەو رۆژەی كە ئەم ئاخاوتنەی تیادا ئەنجامدراوە (سێشەممە) نییە و (چوارشەممە) و (پێنچشەممە). ئەگەری ئەوە هەیە رۆژی (هەینی) بێت، بە نیشانەی ئەوەی ئەگەر وا بوایە دەیگوت (سبەی،دووسبەی،سیٚ سبەی).
٧- (ب) دەزانێت (أ) پلەوپایەكی كۆمەڵایەتی گەورەتر لەخۆی هەیە، بە نیشانەی ئەوەی كە دەڵێت : (گەورەم) .
٨- ئاخاوتنەكەی (أ) و (ب) ئاخاوتنەكی تەلەفۆنییە نەك رووبەروو. بە نیشانەی ئەوەی شوێنی نێوانیان دوورە (٨٠) .

ئەوەی تێبینیمانكرد دەركەوت نیشانە رۆڵێكی گرنگی هەیە لە روونكردنەوە واتای سیمانتیكی و پراگماتیكی، چونكە نیشانەكان زۆر ئەركیان گێڕا لەوانەش: روونبێژی زمان و لادانی لێڵی و روونكردنەوەی واتا بە تایبەتیش لە وشە فرەواتا و هاوبێژەكان، هەروەها ئەو دەربڕینە زمانییەشمان بۆ روونده‌كاتەوە كە لە رێگای هونەرەكانی رەوانبێژی دەربڕاون وەك : خوازە و خواستن و دركە ...هتد. جگە لەمانەش چەمكی واتاكانمان بۆ پیٚ ئاشنا دەكات، بەمەش واتای نیشانە ئەركی گەیاندنی واتای مەبەست دەگرێتە ئەستۆی خۆی .

**٤- ئەنجام:**

١- نیشانە هەموو ئەو ئاماژانە دەگرێتەوە، كە واتامان بۆ روونده‌كاتەوە لە گوتنێكی دیارەوە شتێكی نادیارمان بۆ دەدۆزێتەوە و ئەنجامی كۆتایی پەیوەندی نێوان دوو رووداو دەردەخات، جا پەیوەندییەكە یان هۆییە، یان كۆمەڵایەتییە.
٢- نیشانە گرنگییەكی زیاتری هەیە لە ئاستی سیمانتیكدا، چونكە تەمومژی زیاتری تیا بەدیدەكرێت، جا بۆ ئەوەی رستەكان بواری پرسیار نەهێڵێتەوە ئەوا نیشانەكان بەكار دەهێنرێت بۆ روونكردنەوەی واتای رستە و خستنە رووی مەبەست، ئەم جۆرەی نیشانەكان بە ئاشكرایی دەردەبڕێت .

٣- ئەو نیشانانەی کە ڕۆڵ دەبینن لە لێکدانەوەی واتای سیمانتیکی دەقی نووسراو بریتین لە بەشێك لە نیشانە مادییەکان وەك وێنە و نیشانە هۆشەکییەکان و نیشانە ڕێزمانییەکان و دەوروبەرییە زمانییەکان، ئەوانەی کە لە واتای پراگماتیکیشدا ڕۆڵ دەبینن لە ئاخاوتن و گفتوگۆ بریتین لە، نیشانە مادییەکان، هۆشەکییەکان، دەوروبەرە بارییەکانی وەك: ئاوازە و هێز و وەستان و نیشانە ئاماژەییەکان.....هتد، کە لە دەوروبەردا روون دەبنەوە .

٤- مرۆڤ ئابوریانە قسەدەکات ئەو زانیاریانەی کە لە ئاخاوتن وەریدەگرین زیاترە لە رستە و گوتن، ئەمیش لە ڕێگای نیشانەکانەوە وەریدەگرین .

٥- نیشانە ڕۆڵێکی گرنگی هەیە لە روونکردنەوە واتای سیمانتیکی و پراگماتیکی، چونکە ڕۆڵێکی گرنگ دەبین لە روونبێژی زمان و لادانی لێلی و روونکردنەوەی واتا بە تایبەتیش لە وشە فرەواتا و هاوبێژەکان، هەروەها ئەو دەربڕینە زمانییەشمان بۆ روونەدەکاتەوە، کە لە ڕێگای هونەرەکانی رەوانبێژی دەربڕاون وەك : خوازە و خواستن و درکە ...هتد. جگە لەمانەش چەمکی واتاکانمان بۆ پێ ئاشنا دەکات، بەمەش نیشانە ئەرکی گەیاندنی واتای مەبەست دەگرێتە ئەستۆی خۆی .

## ٥- پەراوێزەکان :


١- (القران الكريم:يوسف :٢٥ – ٢٨)

٢- (خالد بن عبد الكريم بسندي :٣٩:٢٠٠٧).

٣- (تمام حسان: ١٩٠:١٩٩٤)

٤- (عبدالهادى الفضلى:٧٧:١٤١٥)

٥- (عبدالهادى الفضلى:٧٨:١٤١٥) .

٦- (عبدالهادى الفضلى :٧٩: ١٤١٥)

٧- (عبدالهادى الفضلى:٨٠:١٤١٥)

٨- (تمام حسان :١٩١:١٩٩٤)

٩- (محمد محمد يونس:٢٨٨:١٩٩٣)

١٠- (تمام حسان:١٩٥:١٩٩٤)

١١- (تمام حسان :١٩٥:١٩٩٤)

١٢- (تمام حسان:١٩٥:١٩٩٤)

١٣- (کولیزار کاکل عزیز:١٤٠:٢٠٠٩)

١٤- (تمام حسان:١٩٨:١٩٩٤)

١٥- (تمام حسان:١٩٨:١٩٩٤)

١٦-(نەسرین فەخری و کوردستان موکریانی:١٩٥:١٩٨٢ – ٢٠٠)

١٧- (تمام حسان:١٩٩:١٩٩٤)

١٨-(محمد محمد یونس:٣٠٧:١٩٩٣)

١٩-(عبدالله حسين رسول: ٢١٨:١٩٩٥)

٢٠- (عبدالواحد مشير دزەيى:٢٠١١:٤٨)
٢١- (تمام حسان: ١٩٩٤:٢١٣) و ( سليمان بوراس :٢٠٠٩:٢٣)
٢٢- (نورى على ئەمين:١٩٦٠:٤١)
٢٣- (وريا عومەر ئەمين:١٩٨٢:١٨)
٢٤-(وريا عومەر ئەمين :١٩٨٦: ٨٦- ٨٨)
٢٥-(ڤيان سليمان حاجى:٢٠٠١:١٠٦)
٢٦-(تمام حسان:١٩٩٤:٢٠٧)
٢٧- (محمد محمد يونس:١٩٩٣:٣٠٥)
٢٨- (تمام حسان :١٩٩٤:٢٠٧)
٢٩- (محمد محمد يونس:١٩٩٣:٢٩٧)
٣٠- (نور الهدى لوشن :١٩٩٥:٦٤)
٣١- (تمام حسان :١٩٩٤:٢١٧)
٣٢- ( فهد بن سعيد بن عبدالله :١٤٢٧:٩ )
٣٣- (تمام حسان:١٩٩٤:١٩١)
٣٤- (تاڤگه عمر حمەصالح :٢٠٠٩:٧٥)
٣٥- (تمام حسان:١٩٩٤:١٩٦)
٣٦- (كوليزار كاكل عزيز:٢٠٠٩:١٤٠)
٣٧- (Firth:١٩٦:١٩٥٧).
٣٨- مامۆستا صادق بەهائەالدين زارەوەى (جهوارى) بۆ بەكارهێناوە
٣٩- (صادق بەهائەدين :١٩٨٧:٤٦٢)
٤٠- (محمد نورى عارف:١٩٨١:١٣٦)
٤١- (ئەورەحمان حاجى مارف:١٩٧٥: ٥١)
٤٢- (احمد مختار عمر:١٩٨٢:٣٨)
٤٣- (سامى عياد حنا و اخرون:١٩٩٧:٢٤)
٤٤- (محمد محمد يونس :١٩٩٣:٣١٧)
٤٥- (دەروون عەبدەلرەحمان صالح:٢٠١٠:٨٧)
٤٦- (محمد على الخولى:١٩٨٧:١٢٣)
٤٧- (محمد على الخولى:١٩٨٧:١٦٨)
٤٨- (عبدالوهاب خالد موسى:٢٠٠٩:١١١)
٤٩- (وريا عومەر ئەمين:١٩٩٤:١٦)
٥٠- (موفق الحمدانى :١٩٨٢:٢٣٦).
٥١- (كوليزار كاكل :٢٠٠٩:٥٦)
٥٢- (عبدالوهاب خالد موسى :٢٠٠٩: ١٠٢ - ١٠٧)
٥٣- (Martinet:٧٦:١٩٦٤)
٥٤- (احمد خضير عباس:٢٠١٠:٨٢ )
٥٥- (خليل ابراهيم العطية :١٩٨٣:٦٢)
٥٦-.(عبدالقادر عبدالجليل:٢٠٠٦:٧٩)

٥٧- (عبدالقادر عبدالجليل :٢٠٠٦:٨٠)
٥٨- (محمد معروف فتاح :١٩٩٠:٢٠)
٥٩- (كوندراتوف:١٩٧١:٢٠٠)
٦٠- (ستيفن اولمان:١٩٧٥:٩٢)
٦١- (تونيا ريمان:٢٠٠٩:٢٢٠ )
٦٢- (محمد على الخولى:١٩٨٧:١٦٤)
٦٣- (عبدالوهاب خالد موسى:٢٠٠٩:١١٤)
٦٤- (وريا عومەر ئەمين:١٩٩٤:١٥)
٦٥- (محمد علي الخلولى:١٩٩١:١٦٧)
٦٦- (احمد خضير عباس:٢٠١٠:١٣)
٦٧- (إبراهيم بن ناصر الحمود: ٢٠٠٩:- )
٦٨- (احمد خضير عباس:٢٠١٠:٢٢)
٦٩- ( فاضل صالح السامرائى:٢٠٠٠:٥٩)
٧٠- (احمد الهاشمى:١٣٧٩:٢٦٤ )
٧١- (محمد نورى عارف:١٩٨١:١٤٢)
٧٢- (علاءالدين سجادى: ١٩٨٦:٦٧)
٧٣- (احمد الهاشمى :١٣٧٩:٢٥٣ )
٧٤- (ئەحمەد هەردى:١٩٨٤:٦٦)
٧٥- (احمد الهاشمى:١٣٧٩:٢٩٧ )
٧٦- (محمد نورى عارف:١٩٨١:٨٦)
٧٧- (مەلا عەبدولكەريم :١٣٨٩:٥٦٤)
٧٨- (مەلا عەبدولكەريم :١٣٨٩:٥٦٥)
٧٩- (مەلا عەبدولكەريم:١٣٨٩:٥٦٢- ٥٦٣)
٨٠- (Levinson:١٩٩٧:٤٨)

# The Role of clues in explaining the Meaning

Abstract

This research is entitled by (The Role of clues in explaining the Meaning) which aims to clarify the role of clues in explaining the semantic and pragmatic meaning. The important role of the clues is that it is the key used to interpret and analyze texts and conversations, it is a tool to infer invariable event from variable event due to the relevance between them. The clues are divided into three types: (physical, mental and linguistically), which can be divided into mental and conventional clues.

The research consists of introduction, conclusions, and two chapters the first one deals with the following areas: the clues, and types of clues, the second deals with the clues and meaning, and its role in explaining the meaning. In the conclusion the researcher mentioned the most important results which he has proven and abstract in English and Arabic languages.